Peyva serok barzanî
li vekirina pira Bilê 9\8\1999ê

Bismîllahirrehmanlrrehîm
Xûşk û birayên xoştivî ……
silavêt xudê liser hingo hemiyan bin……
Birastî rojeka xoş û geşe didîroka gelê me da ku em şahidêt serkeftina pirojeyekê hoyê mezinîn di welatê xoda ,ev pirojê evro ku em lêre xir vebûyn bo vekirina wî pirojey , pirojeyeke bi zehmete em biwestîn teqdîra erzişê vê pirojey bikeyn çunkî bijlî hindê ku dû parêzgehêt Kurdistanê digehînîte êk , parêzgeha Hevlêr û Duhokê , barê jiyana xelkê deverê dê gelek berev pêşve bet , ji rûyê siyasî û leşkerîş ve, dê gelek û gelek wezçê deverê başţir ket .
Birastî heqqê wan hevalaye ku ev pirojeye bidûmahî înay ,biserkeftî bi dûmahî înay , heqqê rêveberiya rêk û piraye , ya parêzgeha Duhokê ku dinav gelê xoda hest bi serbilindiyeka mezin biken û bizanin ku zor serberzane , zor bi serferazî çûne didîroka gelê xoda û heqqe milletê kurd hemî van biradera bi qehremanêt awedankirinê hisab biken.
Bexteweîrî ne ewe mirov bo xo yê bextewer bit , bexteweriyeka mezin ewe , mirov xelkê hejarê nav gelê xoda bextewer biket. Ev newçe pirojane heqîqet dibine mayê bexteweriya xelkê kurdistabê û şerefa mezin eveye û erkê pîrozîş her eveye .

Ehmîyyeta vî pirojey ne ewe ku dû parêzgeha digeheînîte êk bitinê , lezzeta li hemiyan xoştir ewe ku bi destê kurêt kurdistanê hatiye çêbcêkirin bêy ku li derve kesek hawîkariyê biket yan destekê derve têda hebît .
Cihê serferaziyeka mezine bo partî û bo kabîna sêhem ku berdewam piroje li dî pirojey encam diden , xizmeta kurd û Kurdistanê diken û eve şerefeka mezine , bêguman giyanê şehîdêt Kurdistanê pê şad dibîtin û lazime hemû wextekê em bizanîn ku eve berhemê xwîna wane , ev azadî û serbestiya ku em têda dijîn , eve berhemê xwîna wane û ew hedefê ku wan xwîna xo bo rişti eger hemîş nehatbîte dest , emma beşekê zor li vê amancê hatiye dest .
Parastina wê qurbaniyeka zor divêt , çewa bidest hînana wê

Qurbanêt zor viyan ,evro ji parastina wê qurbaniyêt zor divên û hûn dibînin çend hikûmeta herêmê û dezgayên hîzbî û îdarî pirojên avedankirinê dirust diken hindîş dujmin û nehezên Kurdistanê muhawelê diken xirabkariyê biken û ewan pirojane têk biden , emma lêreda bipêwîst dizanim bêjîm bikoreya çavêt hemî dujmin û neheza ave dankirinewe dê ya berdewam bît , bergirî li xelkê kurd û Kurdistanê dê ya berdewam bêt û her qurbaniyeka lazim bît bo parastina vê destkeftê partî ya hazire ya li meydanê û min divêt zor bi rûn û aşkirayê bêjim bo parastina vê tecrobê , bo parastina vî kiyanî , bo parastina vê azadiyê , her pêngaveka lazim bît em bi şerçî dizanîn , her kesekê jêr her perdeyekê , jêr her navekî , dujminayetiya vê tecrobê biket , dujminayetiya vê azadiyê û vê kiyanî biket li Kurdistanê da em bixayîn dizanîn û dê reftarê we digel keyn ku xayîne digel kurd û Kurdistanê .

Dûmahiyê min divêt ez careka dî bi germî supasa rêveberiya rêk û pira ya parêzgeha duhokê bikem , hemî ew birader û hevalêt ku dest hey divê pirojey da û ez hîvîdarim ku ew teqdêr û xelatê ku şeç nê wan bît bête dabîn kirin li terefê hukûmeta herêmê ve û eve cenabê serokê encûmenê wezîranîşe û ez hîvîdarim her çi zûtir xelatê van qehremanane bête dan çunkî heqîqet jibilî

deçma meç newî , musteheqqî xelatekê taybetişin û ez lêre pêşinyar dikem û ji vêrê û wêve mîdaliyek bi navê mîdaliya avedankirinê bête terxan kirin bo ew heval û biraderêt ku pirojêt xo yên muhîm bi encam digehînin .

Dûmahiyê careka dî bi xêrhatineka hemiya dikem , min di kelemê jî da ku hindek birayêt me yêt Ereb yêt eşîreta şemmer beşdarin digel me da , bi xêrhatina germ bo wanîş dikem û her wekî berahiyêş me gotî Kurdistan ya vekiriye bo wan çunkî heqîqet wan biryetiya kurd û ereba parast , wan qiyemêt esîlêt erebî parastin , hemû wextekê Kurdistan ya vekiriye liber wan çunkî hîç wextekê ne çûne jêr barê hindê ku teçrîb li Kurdistanê da bête kirin û ew beşdar bin têda , çi cara milletê kurd vê ji bêr naket û ez supasiya hemî milletî jî dikem ku birayane û xoyane îstêqbala wan kirî , mumkîne hindek cara meşakilîş hatîne pêş , zerer û ziyanêt waş hatbine kirin , emma bo xatira birayetiya kurd û ereba îhtîramen bo vê eşîreta ku ez tesewirê dikem heqqê wane tehemula her tiştekê hatiye kirin , ez pir ji dil supasiya hemû birayêt xo dikem li menteqê û careka dî supas bo hemiya û diserkeftî bin û her bijî kurd û Kurdistan .

Serok mesûd barzanî

Livekirina pirjê pira Bilê

9\8\1999ê